zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



www.arsivakurdi.org

Sal:1985

21

NAVEROK Rûpel

Zarok fêkiyên malan e.....1
Name.....2
Baran.....4
Zikreşî.....6
Lebatên meriv.....8
Pêkenîn/Brîndar.....10
Çavgirtînk.....13
Malbat.....14
Dîk û rovî/Feysel Xelef...16
Bihar.....18
Li Kurdistanê bihar.....20
Çeto/Bêkes.....22
Çîroka Mûnzûr/Adil Dûran...25
Xaçepirs.....28
Nāverok.....30

www.arsivakurdi.org



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

Bi navê xebatê

Ji bo hevalên ku di kovara KULÎLK de kar ditin

Silavên şoreşgerî bi navê(REXISTINA PARTIYA DEMOKRATI KURD LI SURYA(PARTI) li yekîtiya Sowyet

Di destpêkê de em gelek spasî we dikin ji bo xebata we ya ji bo hînbûn û hînkirina zarokên Kurd.Ji bo belavkirina ramanên pêşketî û ji bo hînkirina zimanê bav û kalan di nav wan de.

Weke ku hûn dizanin zarokên Kurd ji hezaran zarokên cîhanê ne ku mafên wan yên zarotiyê wenda ye.

Ji ber vê yekê em bi çavekî mezin li xebata we dinerin û karekî pêwist û neteweparêz dibînin.

Ji ber vê yekê emê pir kêfxweş bin dema hûn hejmarên KULILK ê ji me re bi rê bikin.Bêguman emê jî karibin ji aliyê xwe alîkariya we bikin,bi kurteçîrokan,bi helbestên ji bo zarokan li gor karîna hevalên me.

Bi hêviya alîkariya pêşxistina kovara(KULILK) ya giranbiha

Û bêguman emê pir kêfxweş bin ku em têkiliyan bi hevre deynin.

-Bijî xebata miletên bindest

Xebata we pîroz be

Rêxistina yekîtiya Sowyet
ya Partiya Demokratî Kurd li Sûrya
(Partî)

Mosko 5/5/1985

www.arsivakurdi.org

B A R A N

Daristan,çîçek,dar û ber tev bi avê dibişkivin û digihin.Bi avê mezin dibin û bi avê aj didin,gul vedidin û meywan didin.

Çandinî,daristan,erd û zevî bi ava baranê bi xwedî dibin.Çaxa baran dibare,av dikeve binê erdê(axê) û dar û ber bi rehên xwe vê avê vedixwin.Çaxa ava baranê di ser ruwê erdê re diherike,gol û çeman dadigre.Em jî bi ava gol û çeman bax û bexçê xwe av didin.



Bi vê avdanê dar û berên me digihin û fêkî û zerzewatan pêşkêşî me dikin.Di bexçan de dendikên zebeş,tehlik ecûr,xiyar,gulê berberoj kundir û wekî din tên çandin Bizir an jî şitlên îsot,firingî,bacan,beqdûnis,kelem(lehane)tivir,gêzer,şelim,silk û her wekî din tên çandin.

Paşê ew zîl didin û hêdî hêdî mezin dibin û dibin lem.Paşê ew lem gur û fireh dibin.Bi vê pêşveçûnê hêdî hêdî fêkî û meywe serê xwe radikin û çavên xwe li dinê vedikin.

Li Kurdistanê her cûre fêkî,meywe û zerzewan tên çandin.Jiyana li Kurdistanê bi piranî li ser çandinî û li ser xwedî kirina pez û dewaran e.Ji ber ku,dijminên me(Tirk,Ereb û Ecem) ne hiştine ku li welatê me pêşdeçûna civakî çê bibe.Ji ber vê yekê piraniya Kurdên li Kurdistanê debara xwe bi çandinî û xwedî kirina pez dikin.

Rola baranê ji bo debara jiyanê gelekî mezin e.Çaxa baran neyê,çandinî (genim,ceh,nîst,nok,kizin,bîstan,garis şoqil.û.w.d)dişewite.Gundî,sala ku baran neyê birçî dimînin û belengaztir dibin.Lê çaxa ku baran bi ser wan de tê,çandinî naşewite.Tiştên ku hatine çandin şîn tên.Gundî,sala ku baran tê bi kêf in,rewşa wan xweş e û ji birçîtî û belengaziyê xilas dibin.

Ji van yekan bêrdariya(fêda)baranê ji bo me pir e.Rola baranê pir mezin e.



Z I K R E Ş Î

Wextekî beqek hebû
Çavên wê tim li der bûn
Carekê çêlekek dît
Agir bi dilê wê ket
"Çi çêleka zikmezin e
Ma xune ji min çêtir e?"
Beqê bi vî awayî got
Dil û hinavê xwe tev sot
Beqê dest pê kir xebitî
Bêhn stend zik lê nepixî
Rengê wê hate guhertin
Çêlîkên wê bi dor ketin
Beqê zikê xwe nîşan da
Go"de îcar ji xwer binerin
Ma min çêlek li paş ne hişt?"
Çêlîkan bi yekdeng gotin"NA"!
Qîjîn bi beqê ket û got"Waaaa!...

www.arsivakurdi.org



Beqê cardin xwe nepixand
Rengê gewdê xwe guherand
Çermê zikê wê vezilya
Ji dil beqê bû wek çiya
"De bêjin bê kî mezin e?
Ma çêlek ne piçûktir e?"
Çêlîkan cardin bersiv dan
"Çêlek ji te mezintir e
Ya xatûna ser textan"
Madê beqê ne xweş bû
Êdî hê zikreştir bû
Beqê zor da nepixînê
Sûnd xwaribû bi yasîn ê
Digot"Çiye çêleka virikî
Wê li paş dihêlim bi vî zikî!
Ji nişkê ve deng belav bû
"Gummm..."zik li beqê teqya bû
Û beqa zikreş parçe bû..

REŞADÎ /28/5/1985

www.kurdishvakurdi.org



Ç A V

Çav organek meriv ya herî girîng e.Çav bi kêrî dîtina meriv tên,Meriv bi çavên xwe dibîne û tiştan ji hev cuda dike.Çaxa meriv bê çav bin,nikarin tiştekî bibînin nikarin bi serbestî bigerin Ji merivên bê çav re"kor" tê gotin.Divê meriv li çavên xwe miqate bin û wan ji her tiştî bêhtir biparêzin.

G U H

Guh jî organek herî girîng e. Meriv bi guhên xwe dengan dibihîze.Çaxa meriv bê guh bin nikarin deng û awazan bibihîzin,dengê tiştekî naçe wan, Ji merivên ku,deng naçe wan re"ker" tê gotin.Merivên ker bi guh in lê belê nikarin bibihîzin.



www.arsivakurdi.org



ZIMAN

Ziman organa axivîn û tamkirinê ye.Meriv xweşî û nexweşiya xwarin û vexwarinan bi zimên fêm dike. Ji aliyê din ziman organa (lebat)axavtinê ye.Meriv bi alîkariya ziman kare derdê xwe bîne ziman û têkiliyê bi merivên din re deyne.Ziman jî lebatek girîng e

POZ(bêvil,defin)

Meriv bi alîkariya poz bêhna xwe dide û distîne.Bi alîkariya poz meriv bêhna xweş û ya ne xweş ji hev cuda dike. Em bi alîkariya poz hewa paqij distînin û ya ne paqij berdidin der.





DEST Û LİNG

Meriv bi destên xwe kar dike û bi wan nermî û hişkiya tiştan fêm dike.Dest û ling di jiyana mirovan de roleke mezin lîstiye û dilîze.

PÊKENÎN

Du leşger

Carekê du kesan li leşgeriyê hev naskiri bûn û bûbûn hevalê hev.Car bi car li hev rûdiniştin û derd û kulên xwe ji hevre digotin.

Rojekê cardin herdû li hev rûniştin bûn.

Yekî ji wan got:

-Erê...erê...Di xortaniya xwe de perê min tune bûn.Min rojekê mişkek girt ew kuşk,xist bêrîka xwe û min berê xwe da xwarinxanekê.Ez çûm li xwarinxanê rûniştim û min gazî kir:

"Ka kuro ji min re goştî berxan bînin"

Ji min re anîn û min tev xwar.Cardin min gazî kir:"Ka kuro ji min re beqlawê bînin" Beqlawe anîn û min ew jî xwar.Dawî min cardin ban kir:

"Ka kuro ji min re şorbekê bînin"

Ji min re şorbek jî anîn.Çaxa şorbe anîn min bi dizî mişkê di bêrîka xwe de derxist û xist nava şorbê

Paşê min bi hêrs ban kir:

"Wehhhh...ev çi mişk e gidî!?...ev çi rezîltiye!..ev çawa xwarinxane ye!"

www.qasyakurdi.org

Xwediyê xwarinxanê hat cem min û ji min re got:

-Gidî,ji bo xwedê dengê xwe meke,de ji te re ev sed benqinot û xwarina ku te xwar jî bila ji te re bimîne û here.

Ez rabûm ji xwarinxanê derketim.Hem min xwarna xwe xwar û hem jî min sed benqinotê xwe stend.

Erê...erê...ka ew rojên xweş!..

Piştî gotina xwe qedand,herdû ji hev belav bûn û her yek çû ciyê xwe.

Êvarî hevalê wî ponijî û xwe bi xwe got:"Bi xwedê ezê jî mîna hevalê xwe bikim,ev fikreke baş e."

Adinî rojê wî jî mişkek kuşt,xist bêrîka xwe û çû xwarinxanekê ji yên bajêr.

Ew li ser masekê rûnişt û ban kir:

-Ka kuro ji min re goştê berxan bînin!

Jê re anîn û xwar.Ewî cardin ban kir:

-Ka ji min re beqlawê bînin!

Jê re beqlawe jî anîn û ew jî xwar.

Ewî cardin ban kir:

-Ka ji min re ava cemidî bînin!

Jê re ava cemidî jî anîn û ew jî vexwar

Paşê ewî cardin ban kir:
-Kuro zû ji min re şorbekê bînin!
Xwediyê xwarinxanê hat cem û got:
-Biborin,wele şorba me nemaye
Yê leşger rabû ser xwe,mişk ji bêrîka xwe derxist û qîriya:
-Êêêê...şorbe tunebe naxwa ezê vî mişkî têxim ku?
Piştî bêhnekê çend kes li ser serê wî kom bûn û li ser serê wî bû terp û rep....,

BRÎNDAR

www.arsivakurdi.org

ÇAVGIRTÎNK



Lîstika çavgirtînkê li Kurdistanê di nava zarokan de pir tê lîstin.Ev lîstik,lîstikek xweş e û meriv bi kêf pê mijûl dibe.

Ev lîstik bi vî awayî tê lîstin:

Çend zarok li hev dicivin.Ev her çend zarok hevdû dihejmêrin(heta 20 an yan jî zêdetir) yê ku li paş bimîne,ew dibe "pîrik"û çavê xwe digire.Çaxa pîrik çavên xwe digire,ewên din xwe li ciyên cuda vedişêrin.Xwe dixin pişt kokelan, pişt sêncan,pişt kevirên mezin.Yan jî xwe di nava tûmên geyê de vedişêrin.

Pîrik heta bi dehan(10) dihejmêre û paşê çavên xwe vedike.Îcar pîrik li wan digere da ku,yekî ji wan bide û xwe ji pîrîtiyê xilas ke.Îcar ewên ku,xwe veşartine divê xwe baş veşêrin da ku pîrik wan nebîne.Heger pîrik yekî ji wan bibîne û bi xar biçe "hilkê" bide,dora pîrîtiyê diçe ji yê din re.Kesê ku,berî pîrê hilkê bide ew jî pîrîtiyê xilas dibe.



M A L B A T

Malbat komika herî piçûk ya civakê ye.Di malbatekê de kalik(bapîr)pîrik (dapîr) bav,dê û zarok hene.Li gelek ciyan bav û dê dev ji mezinên xwe berdidin û ji wan cihê dibin.Li hinek ciyan jî bi hev re dijîn.

Bav dixebite û debara malê dike.Dê di hundurê malê de dixebite.Malê dimale(paqij dike,rêş dike)firaxan dişo,cilan(kincan,çekan)dişo,li zarokan dinere,xwarinê çê dike.Ano"jin stûna malê ye"

An jî"mala bê jin wek dara bê fêkî ye"

Zarokên gihayî diçin dibistanê û li wir fêrî xwendin û nivîsandinê dibin.Zarokên piçûk jî di dergûşên xwe de dikevin xewa şêrîn û radizên.

Di malbatê de divê zarok rûmeta dê û bavê xwe bigirin,hej bra û xwehên xwe bikin.Ji gotina wan dernekevin der.Dilê dê û bavê xwe nehêlin û yên bra û xwehên xwe jî.

Her weha divê dê û bav jî bi zarokên xwe şa bibin,hej wan bikin,li wan nexin û dilê wan ji bo tiştên bilasebeb neşkînin.

Divê zarok guhên xwe bidin gotin û tiştên baş.Tiştên xirab nekin. Diziyê nekin,cixarê venexwin(nekşînin)dilê zarokên cîranên xwe nehêlin

Xirabî dijminê zarokan e,her weha dijminê mirovan tevan e.Qencî jî ji bo başî û rindiya mirovan û jiyanê ye

www.arsivakurdi.org

DÎK Û ROVÎ

Rojekê ji rojan rovî da ser riyekê. Ravî hinekî birçî bûbû,ewî li tiştekî xwarinê digeriya da ku bixwe.Rovî pir çû hindik çû rastî darekê hat.Li ser darê jî dîkek hebû.Wek ku em tev şahid in rovî bi fen û fûtên xwe bi nav û deng e.

Rovî ji dîk re got:

-Roj baş brayê delal!

-Ser çavan û ser seran braderê rovî

Rovî:

-Bibore,ezê gotinekê ji te re bêjim

-Fermo

Rovî:

-Ma te ne bihîstiye ku axê vê êlê biryarek derxistiye ?

-Na bi serê te,ma çi biryar e?

Rovî:

-Axê êlê biryar derxistiye ku,pez û gur,rêsî û berx,rovî û tajî,rovî û mirîşk,tevde bi hevre bigerin û bilîzin

-Na lo!

-Bi serê te yê delal.De fermo dakeve erdê em bi hevre bilîzin.

www.arsivakurdi.org

Dîk:

-Xwe hinekî ragire.Ez dibînim ku tozek ji ber lingên tu heywanan radibe.(Dîk dixwest zanibe bê rovî rast dibêje an na)

Rovî:

-Ez di bextê te û xwedê de tê qenc binere bê ew çine

-Bi serê bavê te wek du kûçkan e. Lê newqa wan pir zirav e,hema ez dibê ew hebin nebin tajî ne

-Nebêj lo!

-Wele,ma qey ez derewan li te dikim!

Rovî go şirşip û bazda.

Bi vê nevê dîk ji rovî xilas bû

FEYSEL XELEF

Mosko/17/4/1985

www.arsivakurdi.org



B I H A R

Demsala zivistanê pir sar dibore.Mirov di vê demsalê de nikarin gelek kar û barên xwe yên derveyî bikin.Ji bo ku,karibin bixebitin,divê rojên germ bi ser wan de bên.

Rojên germ bi biharê re tên.Ro bi rûkenî tîrêjên xwe bera ser dinê dide.Dar û ber bi can dibin.Heywan yeko yeko ji ciyên xwe derdikevin û bi hatina bihare kêfxweş dibin. Meriv bi kêf diçin kar û barên xwe.

Hewa biharê bi carekê tê guhertin.Carna çaxa ro heye te nerî baran bariya.Ber êvarî hewa hênik dibe.

Bihar ji bo zarokan demsala lîstikê ye.Zarok di wan lîstikan de gelekî xwêh didin.Di dema xwêhdanê de divê meriv avê venexwe.Ji ber ku,wê çaxê meriv dê nexweş bikeve.

Demsala(mevsîm) biharê demsala herî xweştir e.



www.pirtukurdi.org

Meha Avdar ê ji bo gelê me meheke pir hêja ye.Destpêkirina vê mehê dawiya zivistanê ye û destpêka biharê ye.

Di dawiya zivistanê de gelê me yên ku li gundan dijîn dikevin pir tengasiyê. Qûtê wan yê ku ji bo demsala zivistanê danîne,li ber qedandinê ye.Êm û alifên heywanan kêm dibe.Çavê herkesî li hilîna berfa serê çiyan dimîne,li benda hatina demsala biharê dimînin.

Bi hatina meha Avdarê ve hêdî hêdî berf dihilin.Di bin berfê de serê kulîlkan xuya dibin.Hêdî hêdî hêşinatî ruwê erdê dipêçe, bêhna gul û gulçînan li derdorê belav dibe û bi ser merivan de difûre. Meriv bi bêhna wan gul û gulçînan,bi bêhna Nêrgiz û beybûnan mest dibe.Bi hilîna berfê re ava ku,li çiyan digihê hev lehiyê pêk tîne.Çem û cobar tên dagirtin. Carna lehiyên xurt û mezin xwe ji jor ber bi jêr ve berdidin û gelek ziyanê digihînin gundan,terş û talana gundan li ber xwe dibe,pirên li ser çeman avabûyî xira dike.

Bi vê nevê dilê herkesî bi hatina biharê geş dibe,kêf û şahî xwe li wan dipêçe.

Dilên belengaz û tengezaran xweş dibe. Hêwiya jiyanê ji bo wan ji nû ve dest-pê dike.

Di meha Avdarê de Kurdistan weke bûka nûhatî dixemile.Deşt û çiya tev hêşin di-bin,dar û ber dibişkivin,ber û meywan diafirînin.Geyayên hêşîn serê xwe li her derê radikin û mizgîniya hatina jiyaneke nû dide meriv,



www.arsivakurdi.org

Li gundekî Kurdistanê jinikek feqîr (jinikek gerok) li mala yekî gundî bûbû mêvan.Xwediyê malê merivekî mêvanperwer bû,ji xwe fedî bû û gundiyan jî pir jê hez dikir.

Êvarî şîva xwe xwarin û ketin sohbetê.Bû wextê razanê.Jinikê ji xwediyê malê re got:

-Wele bi xwedê ez îro pir li van gundan geriya me,kerê min westiya ye û bê êm e,me êmek bidayê baş bû

Navê xwediyê malê Çeto ye.Çeto got:

-Wele rêsiyên me ji zû de xilas bûne û kaya me jî ne maye.Lê yekî gundiyê me va rojan nû ji hecê hatiye û ez zanim êm li cem wan pir e,ji ber ku heywanên wan pir in,ezê biçim hinekî ji wan bixwazim.

Çeto berê xwe da mala hecî Ehmed.Çû ber derî"teq teq" li derî xist.Maliyan derî vekir.Çeto silav da civatê,civatê silava Çeto vegerand û gotin:

-Fermo Çeto rûnê!

Çeto got:

-Na wele ez rûnanêm,Mêvanek min heye

ez ji bo heywana wê hatime hinek ka bixwazim.

Hecî Ehmed got:

-Bi xwedê Çeto li qisûrê meyze meke kaya me jî hindik maye,em nikarin bidin.

Wextê Hecî wilo got,Çeto pir aciz bû, li ber xwe ket û got:

-De baş e,mala we ava

Çeto hema berê xwe dide şikeftê(şikefta Hecî Ehmed ya ku ka tê deye).Şikeft nêzîkî gund e.Çeto kevir û çilo ji ser devê şikeftê radike,telîsê xwe dide ber kayê,heta karîbû ragire tije dike,tavêje ser milê xwe û tê malê.Telîs li ber malê tavêje erdê û ji pîreka xwe re dibê:

-De here cuherê kerê mêvana me dagire bila heta sibê bixwe û ya ku,zêde jî ma bidin cîranan.

Pîreka Çeto dibê:

-Tu li ku mayî vî qasî,te hevqase ka ji ku anî?

Çeto dibê:

-Wele hal û mesela min ev e.Yanî tiro Hecî ye.Ez çûm ka neda min,min jî bêyî

wî ka ji şikefta wan derxist û min anî.

Pîreka Çeto dibê:

-Nabe Çeto,em misilman in malê heram bi kêrî me nayê.

Çeto dibê:

-Wele bi xwedê ji îro pê de ez malê Heciyan li ku zevt bikim ez bernadim. Nêta min hebû ku,ez biçim Hecê jî.Lê hec li ber çavên min reş bû.Ezê sibê herim bajêr ser berber,ezê vê rîha xwe ya ku min li ber destê mala Şêx berdaye,biqusînim.Êdî nema baweriya min bi Hecî û meciyan tê

BÊKES/Hollanda
1985

www.arsivakurdi.org



Ç Î R O K A
M Û N Z Û R

Ji çîrokên gelê Kurd
Çîrok û wêne → ADİL DURAN

Çıyayê Mûnzûr bı gul û çîçekan xemılıye

Çiyayê Mûnzûr bı dar û beran hatiye xemılandın. Tê de kanî û sarınc pır ın dewlemendıya çiyayê Mûnzûr tê de sirên bi heybet vedışêre.

Li gor tê gotın di dema xwe de dı Kurdıstanê de li ba Mîrzade CEMSÎD şıvanekî saf, paqıj û jêhatî hebû. Navê wî şıvanî MÛNZÛR bû.

Lı blûrekê xweş dixist....

Hemû tebayên bi can guh dıdan wî dengî....

RİK

Rokê Mîrzade CEMŞÎD hespê xwe kar dike û diçe nêçîr ê...



Wê rojê Mûrzûr,tê mala Mîrzade û ji xanima pıçûk re dibê...



Xanima piçûk bersiv da



Xanim helawê amade dike



Mûnzûr rahişt helawê..





û bi bazdanê...

ji ber çavan wenda dibe..



Mîrzade Cemşîd ji nêçîrê vedigere.Çaxa xanima malê sênıya helawê nabîne,bawer dike ku,Mûnzûr derew lê kıriye.Mîrzade Cemşîd fermanê dıde merivên xwe

www.kurdishstudies.org


Herin lı Mûnzûr bigerin!
?
?
tevde ecêbmayê dımînın..
?
Wê şevê heta sibê li Mûnzûr geriyan
Ji nişkê ve rastî manzarakê ecêb hatın
Jı wê rojê û bı vir de,jı wan çiyan re"çiyayên Mûnzûr" û jî çemê wê re jî "çemê Mûnzûr" tê gotin.Ev cîh bûye ziyaret û gelê Kurd hertım diçe tewafa vê zıyaretê
Sîtıla şîr ya Mûnzûr rıjyaye..cihê ku şîr lê rıjiyaye û cihê ku,Mûnzûr pêlê kirıye bûye kanî û av jê dibelıqîne
27
Dawî —1986

XAÇEPIRS



ÇEPERAST

1-Kurdekî bi nav û deng

2-Gotina telefonê

3-Qedir,rêzdarî,hurmet

4-Du tîpên bê deng...noteyek

5-Navê kur an mêrekî

6-Hacetek muzîkê

SEREJÊR

1-Zarokên ku diçin dibistanê

2-Eşîr,ezbet

www.arsivakurdi.org

3-Kesên ciwan

4-Tiştê ku li dara"Berû"dikevin(berepaş)

5-Tayê por,bi her merivekî re heye

6-Mîr,padîşah

7-Fikir,raman

x x x x x x x x x x x x x x x

Bersiva xaçepirsa hejmara 20 an



www.arşivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS
BIHA : 10:- skr

www.arsivakurdi.org